**Mele Nûriyê Hesarî**

# Zanhaweya Pêxember

## (Mewlûda Pêxember)

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ne**

Navê pirtûkê

**Zanhaweya Pêxember**

**(Mewlûda Pêxember)**

Daner

**Mele Nûriyê Hesarî**

Pêşgotin û veguhestina tîpan

**Dilawerê Zengî**

Tîprêzî

**Gulistan Emîn**

Bergsazî

**Şengo Dumilî**

Çapa yekem

**2724k - 2024z**

Rojavayê Kurdistanê - Qamişlo

Çapxane

**Beyan**

Qeware: 14c.m X 20c.m

Jimara rûpelan: 160

# Pêşgotin

Di zimanê Erebî de, ji bêjeya rojbûn û jidayikbûnê re (Mewlûd), ango li ser cih û dîroka rojbûna Pêxember Muhemmed, hatiye gotin. Bi demê re, rengekî din li xwe girtiye. Jidayikbûna Pêxember, an jî rojbûna Pêxember, salrojeke (bîranîna) salane ya roja jidayikbûna Pêxember Muhammed kurê Abdullah di 12 (Rebî'ul Yekem) de ye. Gelên mislimanan her sal li hin welatên îslamî wê rojê pîroz dikin, ne wek cejin û perestinekê, belkî wek şahiya ji rojbûna Pêxemberê xwe re.

Dema Pêxember li jiyanê bû, hin dost û hogirên wî yên helbestvan mîna Abdullahê kurê Rewaha, Ke'eb kurê Zuheyr, Ebas kurê Mirdas û Hesenê kurê Sabit bi helbestên xwe pesnê Pêxember û derhoze, sersiroşt û doza wî didan, û piştgiriya xwe jê re didan xuyakirin. Nivîsandina helbestên bi vî reng û şêweyî ji dema Pêxember dest pê kiriye, û di demên din de, ji alî helbestvanên misilman ve hatiye nivîsandin, û her ku çûye hejmara wan pir bûye. Piştî mirina

Pêxember, û di roja jidayikbûna wî de, ew helbest ji aliyê heval û hogirên wî ve dihatin xwendin. Lê ne bi awayekî fermî û salane ew salveger dihat bikaranîn. Jidayikbûna Pêxember roja Duşemê, diwazdehê meha Rebî'ul-Ewlê ya sala Fîlan bû, dema ku ji Pêxember li ser rojiya roja duşemê hat pirsîn, wî bersiv da û got: (Ez di wê rojê de hatime dinyayê û di wê de ji min re xuya bû).

Gelên Îslamê, di her sala Koçî ye nû de, roja jidayîkbûna Pêxember pîroz dikin û misilman jî her sal vê rojê bi rêzgirtin û nirxê Pêxember (Silavên Xwedê lê bin) pîroz dikin. Bêguman, pîrozkirina van rojên mewlûdan, ji hezkirina Pêxember pêk tên. Ev pîrozbahî ji dema Fatimiyan –li Misrê- di sedsala 10ê de, dest pê kiriye. Hin lêkoler û zanan destnîşan bi wê yekê kirine ku, kê hizira pîrozkirina salvegera jidayikbûna Pêxember daye destpêkirin û kê yekemîn salroja jidayikbûna Pêxember kiriye cejinek ku li hemû dewlet û civaka îslamî tê pîrozkirin. Ew kurên Ubeyd El-Qeddeyê Fatimiyan in, ji ber ku ev pîrozbahî di serdema Xelîfeyê Fatimiyan El-

Muizz Li Din Allah piştî ketina wî ya Misrê di sala 969an de dest pê kir.

Di serdema Eyûbiyan de, pîrozbahiyên rojbûna Pêxember di serdema Siltan Selahedîn de, bi rêkûpêk bûn. Her sal ew pîrozbahî dihate kirin, û gelek pere ji bo pîrozbahiyê dihat xerckirin. Yekemîn kesê ku Mewlûd bi awayekî berfireh û birêkxistin pîroz kir, mîrê Hewlêrê (Başûrê kurdistanê), Şah Muzefer Ebû Se'îd Gokborî kurê Zeyneddîn Elî kurê Buktakîn bû û yê ku merasîmên mewlûdê li Îran, Anatolîya û Sûriyê belav kirine û Mizgefta Muzeferî li serê çiyayê Qasiyûn li bajarê Şamê ava kiriye. Ew bi xwe Zavayê Selaheddînê Eyyûbî, mêrê Rebî'e Xatûn bû. Di dema Osmanîyan de, piştî Mûradê sêyemîn, pîrozbahiyên mewlûdê bi awakî fermî hatine lidarxistin.

Mewlûdên ku neteweyên din (Kurd, Tirk, Faris ... hwd) nivîsandine, bi piranî yan ji 'Erebî hatine wergerandin yan jî, ji 'Erebî sûd wergirtine û hatine nivîsandin. Mafir zimanê olê zimanê erebî ye, wê kartêkirina wê li gelên din hebe. Sê cûre mewlûd hene. Yek ji wan mew-

lûdên helbestkî ne. Ya din mewlûdên pexşanî ne û ya sêyemîn jî dîsa bi piranî di mewlûdên 'Erebî de hatine nivîsandin û pexşan û helbest bi hev re hatine bikaranîn.

Yekemîn mewlûd, bi zimanê 'Erebî hatiye nivîsandin Mewlûda kurê Hecer El-Heytemî (1503-1566), û ya din jî Mewlûda Berzencî ye.

Yekemîn Mewlûd, bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin Mewlûda Bateyî ye.

Di Kurmancî de: - Mewlûda Bateyî (1689-1755) ye. - Seydayê Tîrêj, Mewlûda Pêxember, veguhestina tîpan û pêşkêşkirina Dilawerê Zengî, çapxana Emîral, Beyrût, 2009.- Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), Mele Nûriyê Hesarî ( PIRÊŞAN ) - (1934 – 2011)..... hwd.

Di Soranî de: - Husênê Qazî (1810-1875) ye. - Mela 'Ebdullahê Koyî yê Celîzade jî (1835-1908) û .....hwd.

Di Horemanî de: - Mewlûda Mele Ebdullahê Bilberî ye ... hwd.

Di Kirmanckî/Zazakî: - Mewlûda Ehmedê Xasî (1867-1951) ye. - Mewlûda Osman Esad Efendî (1852- 1929) ye. ... hwd.

Mewlûd cûreyeke wêjeyî-olî ye, û mijara wê jiyan, sersiroşt, derhoze, zanhawe, tevger û serhaweyên Pêxember in. Bi gelek zimanan mewlûd hatine nivîsandin. Bi taybetî di zimanê 'Erebî de mewlûd bêtir hatine nivîsandin. Di zimanê Kurdî de, Mewlûda Bateyî bandoreke mezin li ser şêwe û naveroka mewlûdên kurdî kiriye. Bi saya mewlûda Bateyî, di wêjeya kurdî de riyek li mewlûdnameyan hatiye vekirin, û heta van salên dawî jî mewlûd hatine nivîsandin.

Yek ji van mewlûdan mewlûda zimanzan, helbestvan û nivîskarê gewre Mele Nûriyê Hesarî ye. Mele Nûriyê Hesarî ji bilî nivîsandina çîrok, helbest, ferheng û pirtûkên li ser zimanê kurdî mewlûdek bi navê (Zanhaweya Pêxember) afirandiye. Bi zimanekî paqij, bedew, hêsan û hunereke pir bilind hûnandiye. Mewlûda xwe bi awayê helbestên (Mesnewî) nivîsandiye; her malikek bi yazdeh movik û kîteyan, bi kêş û bare afirandiye. Mewlûda Mele Nûriyê Hesarî 505

malik û 17 beş in. Ji bilî beşek di dawiya mewlûdê de, bi navê Pesindana Pêxember û beşek dî bi navê Zarîkirina Piştî Zanhawe û helbestek dirêj di pesnê Pêxember de, ku ji 34 malikan pêk tê. Destnivîs ji 75 rûpelê 21cm X 29cm de, bi nivîsandina dektîlo (tilnivîs) hatiye nivîsandin. Di vî warî de Mele Nûriyê Hesarî dibêje: Mewlûd ''Zanhawe, di sala 1973yan de, di heyva (Zeynhate), bi çêkirina min û bi danîna xêzên min kuta bû. 17 perçebêj in. Û dergehên me bi (Tevtilî= dektilî), di sala 1984an, 26ê heyva Gulanê de hate nivîsandin''.

Belê, Mewlûda Mele Nûriyê Hesarî bi navê (Mewlûda Pêxember) hatiye binavkirin. Li hin deveran bi navê (Zanhaweya Pêxember) jî jê re hatiye gotin. Belê min jî li ser daxwaza malbata Mele Nûriyê Hesarî ev destnivîs ji tîpên 'Erebî veguhestiye tîpên Latînî, sererastkiriye û pêşgotin jê re nivisandiye.

Armanca me ji amadekirina (Mewlûda Pêxember) ev e: Em vî berhemê hêja ji mirinê rizgar bikin. Mewlûda Pêxember bi tîpên Latînî û bê kêmasî bigihînin destên xwênerên xwe û

gewherek li gencîneya Mele Nûriyê Hesarî zêde bikin. Herweha, em bi hêvî ne ko bi vî karê xwe me pirtûkek pir nirxbilind, hêja û zêrîn li pirtûkxaneya kurdî zêde kiribe.

Di dawiya gotina xwe de, ez spasiya malbata Mele Nûriyê Hesarî dikim û bi taybetî kurê wî Ebdulwehab Hesarî yê ku ev bawerî da min. Bi saya Xwedê û bi saya serê wî ev pirtûk wê ronahiyê bibîne. Herweha, ji dil spasî û destxweşiyê li Gulistan xanim dikim, ku bêyî ked û xebata wê ya berbiçav, gelek dijwar bû ev berhem ronahiyê bibîne.

**Dilawerê Zengî**

Rojavayê Kurdistanê - Qamişlo


06.06.2024

Zanhaweya Pêxember (Mewlûda Pêxember) ......................... 10

# Jêrbiwarî

Bi zarê (Erebî) ji vê niviştê re dibêjin (Mewlûd), ango li ser (Zayîna) jidayikbûna Pêxember hatiye nivîsandin. Belê, ez dibêjim ku bi kurdî em bibêjin (Zayînhawe), li gorî wê ye; ango hawê çêbûna wî, çilo çêbû?, li ku derê çêbû?. Belê ev nivişta min û yên dî jî, ku çax û haweyê zayînê tenê dibêjin. Belê dabaşa jîna Pêxember tev dibêjin, her wekî ez jî dibêjim naxwe evê peltaxê bi (Jînbiwarî) binav bikim. Hîn çêtir û li gorî wê ye. Lewra ezê dabaşa jîna Pêxember wekî ez zanim, ezê bêjim. Vêca çi (Zayîndem) û çi (Jînbiwarî) herdû jî çêdibin. Belê ji ber ku serê vê niviştê û binê wê herdû dabaşa jîna Pêxember in. Emê navê wê (Zayînhawe) deynin. Yên ku haweçêbûna wî, ger çi di nîvê wê de pesin û haweyên wî yên ciwanî û mezinatiyê jî hebin. Belê hîm û vîn di vir re çêbûn û zayîna wî ye û jînbiwariya wî ji bo dirêjkirina pesnê wî tê nivîsandin û hûn ji min re sax bimînin.

**Mele Nûriyê Hesarî**



پصتنێ خوندنا ( زانهاوی )

بناڤی خودانی بلند ومزن — أمی هر دڤی خندنی ببزن

د دم پسنی ڤنجی ژبو وی گلك — د گل قاصدی وي أوي چاڤ بلك

دگل دوستو یاری بوي باورن — دگل ای ژ بو وان بر أو یاورن

محمد خدی ناس أو شاهی بلند — شمال و بروسنکا د باژار وگند

خدی أو مزن کر ژ بومه شیاند — چه تشتی خدی گوت بمه وي گهاند

خدا گوتیه بو وي پسنا بدن — فرشت هر لـ سروي بروداً د دن

أمی هر ببیژن لـ سر ڤنجیه — خوداوی ژ سرمه ببي رنجیه

چلو هات جیهان ژ باڤ و دیا — نهاوی ژ بو و ببي پرخولیا

دگهدار ببه تو لـ من هی برا — أزی بوته بیژم ژ هورو گرا

مه چیکر بزاري خوه یي پربها — ژ بو بیته خوندن لـ گوري گها

أڤینا محمد ژ بو گشببي — دلی نشتڤانا گلك خوش ببي

ژ هیزدان بکن هیڤییو زاریا — بر أو ژ بو وا بکی آریا

ژ بونا محمد بدن شاباشا — تو د کاري بـ حفتو ششا

بزانن محمد چلو چیبو یه — لـ کو چی بـ وه أو کرکی بـ وه

أمی بو وه بیژن دگهدار ببن — ژ بو أڤ جهی مه بـ کلداربین

ژ بونا گنه بینه ششتن ژ مه — پیروز بن جل و خوار نامه لـ مه

روی مه ببي گش بـ شوڤو بریز — دلی مه ببي ساده ونرم زیز

**Rûpelek ji destnivîsê**

## Perçebêja 1

### Perçebêja bav û kalên

### Muhemmed ên pêşî

Bi navê Xwedayê bilind û mezin

Emê her di vê xwendinê da bezin

Mirovê riya rast weha gotine

Li wan ke tu guhdariyê bê çine?

Dibêjin Muhemmed bi ol û bi êl

Ji (Ednan) heta wî bi rêz û bi têl

Ji (Ednan) heta (Ebdulah)ê şepal

Yek û yek dihat pêşiya wî zelal

Teva jin di anîn bi mehra Xweda

Bi tolaziyê ew ne bûne geda

Kurê (Ibrahîm) her ewê bê guman

Kurê (Ismaîl) ew çira her deman

Dibêjin kesên paqij û zanewer

Ji hijmartina bavikê wî bi ger

Ji (Ednan) heta ku biçî (Ibrahîm)

Bi heyran bibim bo ewê rû bi sîm

Ji (Ednan) re çêbû kurê wî (Mû'ed)

Emê pir bibînin ji wî taze ked

Kurê wî (Muder) ê ku pir bûye nas

Di pey wî dibêjin kurê wî (Ilyas)

Kurê wî di pey wî re (Mudrîke) ye

(Xuzeyme) (Ken'ane) (Meder) jî heye

Di pey wî re êdî bi nav (Malik) e

Ji wî her nehê dî re ew kalik e

Di pey wî (Qureyş)e bi navê Fehir

Heçî bê li pey vî Qureyşî bigir

Di pey wî re (Murre) (Kîlab) û (Qusey)

Hemî kalê wî ne bizane tu hey

Li pey wî bi navê xwe (Ebdulmenaf)

Di pey wî re (Haşim) ne pirse tu zaf

Di pey wî re (Ebdulmutelib) çiya

Ku şewqa (Muhemmed) di wî bû xuya

Ji vî şewq ku daket giha (Ebdulah)

Ji canê wî çêbû çira her kulah

Ev in bîst û yek bavik in û bira

Xuya ne bi navê xwe rengê çira

Di (Mekkê) ji nava Qureyş û 'Ereb

Jinek pir xuya bû (Emîna) Weheb

Diya (Ebdullah) ew ji wî re dixwest

Bi mehrek duristî di nav wan de best

Naxwe (Ebdullah) bûye bavê ewî

(Emîna) ketî ber evî bedewî

Heçî ew bi navê xwe (Muhemmed) e

Riya wî tucarî xwe jê bernede.

*Muhemmed e*

*serdar û şêr û şahê cîhanan*

*Muhemmed e*

*serkanê furiştê ser asmanan*

*Muhemmed mehdervan e*

*bo jîndar û her canan*

*Muhemmed*

*alî kê bî ew her navê dermanan*

## Perçebêja 2

## Hodeya çêkirina

## (Zayînhawê) bi kurdî

Bi navê Xweda ez dibêjim evê

Di pesnê Muhemmed bi roj û şevê

Di gel dost û yar û hevalê ewî

Ewê kû bi wî re dikî peyrewî

Ezê çê bikim vê nivîştê bira

Bi kurdî ji bona piçûk û gira

Heçî  kû di îro li cîhan heye

Evîndar û dostê zimanê xwe ye

Nivişta bizarê xwe peyda dikin

Bi zarê biyanî gelo dê çikin

Çi tiştê mirov jê nebî fêr û nas

Wekî yê bi sol e, belê maye xwas

Zimanê me Kurda çi nerm û xweş e

Di çavê neyaran çi kêm û reş e

Heger em bi kurdî nebin zanewer

Çilo em di  karin riya bibne ser

Ji bo yê nexwenda hemû fêr bibin
Di olê xwe da ew geş û têr bibin

Hemî Kurd nizanin zimanê tevan
Zimanê me bo me ketî ser devan

Gelo qey ne baş e bidim zariyan
Ji bona Muhemmed bi zarê diyan

Ji bo fêr bibin hûr û gir, mêr û jin
Wekî her kesî em ciwamêr bijin

Çilo tê bi tirkî bidî peyvekê
Ji bo kû mirovek bi ter deynekê

Bi kurdî bixwîne ji bo her kesî

Gelo tû digel deh mirovan besî

Çiqa Kurd bibin fêr wilo qencî ye

Kesê bê nebaş e gelo ew kiye?!

Çi başê Muhemmed bera pir bibin

Çi aşê ziwa bin kû avir bibin

Çi zarê hebin ew Xwedê daniye

Zimanê me jî yek ji serkaniye

Çima tê bi tirkî bidî şabeşa

Di nava sedî de ji bona şeşa

Bi kurdî bixwînî ji bona sedî

Bera şeş bimînin heya bê fedî

Bera nasbikin ol kesê bê ziman

Jin û keç digel wan kesê pir xizan

Heger tû bi kurdî ne bêjî çilo

Gelê Kurd dizanî bibêjî wilo

Nivişta bi kurdî ji nû peyde kin

Li dijmin nenêrin li xwe meyze kin

Gelê Kurd ji dijmin ti bawer nekin

Ziman tev li alî Xweda da yek in

Zimanê me kevn e zimanê berî
Bi zarê me çê bûye Pêxemberî

Zeredeşt bizane bi zarê me bû
Zimanê me pêşî ser û paşe bû

Neyar hişt zimanê me winda bibî
Tu dîsa bixwînî gelo wê çi bî

Bixwîne tu çêtir ji rengê berê
Ji dil der dike vê kul û kederê

Ibrahîm û Nûh herdû Pêxember in
Bi deng in li cîhanê du serwer in

Zimanê ewan herdiwan kurdî ye

Li gorî dizanim mi ev gotiye

Ji ber kû ji zûda mi evna bihîst

Bi kurdî mi ev nameya xwe nivîst.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 3

### Pesnê xwendina Zanhawe

Bi navê Xwedanê bilind û mezin

Emê her di vê xwendinê da bezin

Didim pesnê qencî ji bo wî gelek

Di gel qasidê wî ewê çavbelek

Digel dost û yarê bi wî bawer in

Digel ê ji bo wan ber û yawer in

Muhemmed Xwedênas û şahê bilind

Şemal û birûska di bajar û gund

Xwedê ew mezin kir ji bo me şiyand

Çi tiştê Xwedê got bi me wî gihand

Xweda gotiye bo wî pesna bidin

Furişt her li ser wî di rûda didin

Emê her bibêjin li ser qenciyê

Xweda wê ji ser me bibî rençiyê

Çilo hate cîhan ji bav û diya

Niha wê ji bo we bibî pir xuya

De guhdar bibe tu li min hey bira

Ezê bo te bêjim ji hûr û gira

Me çêkir bi zarê xwe yê pir biha

Ji bo bête xwendin li gorî guha

Evîna Muhemmed ji bo geş bibî

Dilê niştevana gelek xweş bibî

Ji Hêzdan bikin hêvî û zariya

Bere ew ji bo we bikî ariya

Ji bona Muhemmed bidin şabeşa

Heta tu di karî bi heft û şeşa

Bizanin Muhemmed çilo çêbûye

Li kû çêbiwe û kurê kê biwe

Emê  bo we bêjin de guhdar bibin

Ji bo ev cihê me bi kuldar bibin

Ji bona guneh bêne şûştin ji me

Pîroz bin cil û xwarina me li me

Riwê me bibî geş bi şewq û bi rîz

Dilê me bibî sade û nerm û zîz

Ji bona Muhemmed bibin dost û yar

Bibin dûr ji rêça kesê pîs û xwar.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 4

# Çêbûna Muhemmed û sosretên pê re xuya bûne

Muhemmed berî tiştê cîhan hebû
Belê hîn di perda Xwedê berze bû

Xweda xwest wî derxî cîhana niha
Di laşê diya wî Emîna biha

Diya wî Emîna keça Zehrî ye
Di xewnê de dî kû bi wî mayî ye

Ew e serwerê her çi tiştê heye
Di çaxê te danî çi kêfa te ye

Di asman û qadan bi vê ba kirin
Perî hem cenawer bi vê şa kirin

Muhemmed ji wî re bike durv û nav
Di dil de bihêle nebêje ti gav

Emîna zerî xanima Mekkehê
Li ser her jina ew dikî difrehê

Du heyva dima ew li ba Ebdulle
Xwedê da dilê wê di hingî kul e

Çikû Ebdullah heyvekê ma nexweş

Li cem xal û malê xwe çû ew,  tu xweş

Li şehra (Medînê) wî canê xwe da

Jina wî Emîna tenê ma geda

Di piştî ku neh meh bi heyvê diçûn

Dibû çaxê derbî ewê tazegûn

Şeva kû diya wî dikir kû bizê

Dibûn pîrikê wê gul û nêrgizê

Sitî Meryema Asiya tev hina

Surîştê Buhiştê di rengê jina

Di nêzî şeveq bû di roja Duşem

Duwazdeh bihûrîn (Rebî'a yekem)

Di sala şerê Fîl ku tev bûn kelek

Di bîstê Nisanê bihar bû felek

Di hingî de bû der Muhemmed emîn

Ji kêfa furiştê cihan tev kenîn

Cihan hişk û hola bi nû bû hişîn

Hemî meywe pîr bû hesan bû çinîn

Pez û hiştirê cem Qureyş peyivîn

Bi vê hatina wî bi kêf û evîn

Bi vê pêjinin her kesê zane bûn

Ji vê tirsiyan rahibê age bûn

Muhemmed ku çêbû berê çê kirî

Ji mêjû ku navik berê jê kirî

Bi bêhna xweş û laş bihata nûgul

Bi laşê xwe şûştî bi du çavê kil

Du destê xwe danîn serî radikir

Bi bal asîman ve bi çav badikir

Ji bo tev bizanin ewê yê bilind

Ti kes nîne wek wî di bajar û gund

Diya wî ji (Ebdulmutelib) re şand

Ewî jî bilez xwe bi bal ve gihand

Di piştî ku dî ew kurê nazenîn

Li can û ceger ket rivîna evîn

Bira ke'bê yê ew di destê Xweda

Ji bona kurik her nemênî geda

Di Mekkê de çêbû di maka cihan

Birûska xwe avête qadê Iran

Çiko piştî çêbû kurê wek çiya

Gelek sosret û kes nedîbûn xuya

Ji bona ku cîhan bizanin gerek

Ewê yê bijarî ji bona serek

Ji wan yek ewê dêw dikin zûrezûr

Ji guhdariya asiman bûne dûr

Sitêr û çi heyva zikê asiman

Ji ber kû  nizimbûn bi pir şewq didan

Digel wî çi şewqek mezin bûye der

Ji (Busra) qesir jê xuyabûn li ber

Li axa Îraqê li şehra giran

Hejî şehneşîna (Enûşêrewan)

Ji heywanê lenger gelek hatne xwar
Şîkest textê Kesra ji tirs û hewar

Vemirtin li Îran çi agir hebûn
Gelek sosretê dî ji wî  peydebûn

Li bajarê (Sawe) çi derya hebû
Di hingê de ava wê tev berze bû

Newala (Semawe) çi hişk û kevir
Ji nû kaniyek bûye peyda li wir

Zilamek Yehûdî li Mekkê hebû
Her û her di çavnêriya wî de bû

Şeva kû Muhemmed dihatî cihan
Bi vî tiştê çêbû ji wî re guman

Di pirsî kesê kû li wir der biwe
Di îşev kurek qey li vir çê biwe

Qureyşa digot em nizanin bi wî
Ewî got binêrin li min bêxewî

Di  îşev de çêbûye Pêxemberek
Ji bo vî  gelî hatiye serwerek

Li nav dû milê wî nişanek heye
Dema çûn dipirsîn didîtin weye

Yehûdî bi wa re diçû hindirû
Emîna kurik şanî darû bi rû

Di çaxê nişan dî li nav dû mila
Ji hiş çû Yehûdî ji derd û kula

Dema kû hişê wî dihatî serî
Digo çû ji destê me pêxemberî

Gelî van Qureyşa ji min zanibin
Hunê pir bi vî lawikî şa bibin

Ji bona we zengil niha naliya
Wê navê we der bî li her aliya.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

**Perçebêja 5**

## Dabaşa şîrdana wî (Çilo hate şîrdan)

Diya wî di çend roja ew şîr dida

Di pey de ji cem xwe ewê kir cuda

Siparte (Şiweyba) ewa Eslemî

Ewê şîr didayê di çendek Şemî

Digel wî kurê xwe (Ebî-Selame)

Digel ê dî (Mesrûh) bi kom û ceme

Berê wî dida apê wî (Hemzete)

Ewê kû di ber ol de bû çend qete

Li cem Se'diyan bû nebûn û hewar
Jinê wan teva xwe kirin şîredar

Hemû hatibûn Mekkehê da bibin
Kurê kû piçûk bin pera pê bixwin

Heçî hat û yek wan ji bona xwe bir
Heçî ka Muhemmed kesî ew nebir

Didîtin Muhemmed ji bav sêwî ye
Ji alî pera wa nekir hêvî ye

Ji bona xwe ew bir (Helîma) bi deng
Ji malbata Se'dî jina şox û şeng

Helîma gelek sêfil û pir hejar

Di sîngê ewê şîr nema bû ticar

Ji ber vê kesî kur ne dane ewê

Muhemmed giha dest ewê çavkewê

Helîma ziwa bû ti şîr pê neket

Kesî kur nedanê bidest wê neket

Xwedê kir Muhemmed giha wê gulê

Ji bo kû ji dil derbixî wê kulê

Ji bo wê Xwedê şîr gelek jê rijand

Digel Dumrete wî ji sînga mijand

Di pêşî zebûn bû Xweda kir qelew
Di piştî hejarî bi mewdan bû ew

Xweda jê re heyvek dikir roj û meh
Di sê roja rabû li ser pê diçeh

Di hingî de rabû bi zarê xweşik
Bi (Ellah û Ekber) di peyvê sivik

Di pênca de pêkê xweşik dane pêş
Di heyva neha bû kurek pêşekêş

Di piştî mezin bû hinek bû rewan
Di çû pêşiya (Dumrete) ew ciwan

Hemû tiştê qencî di wî peyde bû

Piçûk bû ji mêrê mezin wêde bû

Birê wî diçû ber pezan ew li mal

Digo: Çir bi wî re  xwe nakin heval

Bi wî re diçû ber pezê Se'diyan

Nema dîn ji nû ve tu êş û ziyan

Li cem wî qelew bûn dizan her çi pez

Hemû xelkê Se'dî ketin kêf û lez

Pezê wa dibû têr bi kêf û geşî

Bi hev re buhartin çi rojên xweşî

Birê wî ji dest wî gelek tişt didîn
Hesan kir piyê wê pezê bû birîn

Didî şêr li ber wî di rawestiya
Di pey de bi tore ji cem rewiya

Birê wî çi tiştê bidîta li wir
Digote Helîma ji hûr û ji gir

Helîma digo: Ez hejar û geda
Ji lew ev kurê baş dida min Xweda

Di pey re furişt hatin û ew birin
Ji çavê birayê wî winda kirin

Dilê wî qelaştin kirin der ji wî

Girêka ji xwîna reş û kirne cî

Bi berfê dişûştin, bi nûra zelal

Kirin dagir û nû dirûtin delal

Bi muhra xwe lêdan ji muhra Xweda

Kirin ser teraz û giranî dida

Bi qasî hezarî ji mêrê peler

Ji zarokiyê de nekir lez û ger

Dema Dumrete hate malê bi kin

Digo: Hey hewar e Muhemmed birin

Helîma dinalî digo: Hey hewar

Gelo qey heyî wî bibînim ti car

Ji kahin dipirsî gelek lê girî

Nedî wî ji bêgavî dev jê gerî

Weha ma di sê roja ta kû di hat

Kula cerg û canê Helîma hilat

Helîma ji kêfa bi lez ew hiland

Gelek maç kir û ew bi mal ve gihand

Digo: Hey kurê min te cergê mi sot

Çi tişt hatibû ser ji dayê re got

Helîma digo: Ev kurê rûgewez

Divê em bibin cem diya wî bilez

Helîma didî kariwan der dibî

Ewê kir Muhemmed bi wa re bibî

Muhemmed li kerkî seqet kir siwar

Ji bo wî kutakî ji destê neyar

Kerê kû her û her dima ew li paş

Dida pêşî karwan de rast û di kaş

Hinek hatibûn kuştina vî kurî

Kerê mê seqet wek qulinga firî

Muhemmed bi çavê Xweda zariya

Li wan gawiran agirek bariya

Ewî agirî tev de berbat kirin

Hevalê Helîma hemû mat kirin

Helîma ji tirsa ji nû ew revand

Bi alî diya wî (Emîna) gihand

Di gote (Emîna) çi derd û hewal

Ewa kû di hate serê wa li mal

Helîma kurê Emîna daye wê

Ji bo kû li cem wê bi wî tişt newê

Di piştî Muhemmed (Xedîca) dibir

Diya wî helîma diçû cem liwir

Muhemmed bi kêf û xweşî ew hewand

Bi şîraniyek pir li cem xwe hedand

Di roja (Huneyn)ê de dîsa dihat

Li cem leşker û kom û xelk û civat

Muhemmed cila xwe li ber radixist

Bi comerdî û rêç û karê durist

Dibêjin Helîma tevî Se'dîye

Hemû ketne ola misilmaniye

Jiyarî Muhemmed jimartin hine

Evê ha hinek rast wiha gotine.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 6

### Paqijiya Muhemmed

### û çûna bi alî (Busra) ve

Muhemmed ku çar sal kirin ew ji dûr

Tevî dê diçûne Medîna binûr

Di piştî vegeryane malê liwir

Di rê de (Emîna) li (Eywayê) mir

Diya Eymenî ew li cem xwe dihişt

Heya kû bi (Ebdulmutelib) gihişt

Ewî radihiştê bi dilkî tenik

Digo: Ev kurê min wê rabî xweşik

Kesê jê re baş e li wî aferîn

Ti tiştê piçûka li ser wî nedîn

Ji birs û ji tînê nekir gazinek

Firek av ji zemzem dikir xwarinek

Ji (Ebdulmutelib) ku can bû sipar

Di çû cem (Ebîtalibê) namidar

Gelek guh dida wî wekî zariwan

Dikir pêşiya qîz û xortê ciwan

Dema wî ji sala diwazdeh dikir

Digel xwe (Ebîtalibî) ew dibir

Ji bona herin Şam ji bo karekî

Bi rahib (Buheyra) gihan carekî

(Buheyra) bi çava didî ne bi xew

Ku Pêxemberê paşîdem her e ew

Digo: Ez dibînim ew e sercîhan

Ewe peyk û hem qasidê serşehan

Didî dar û ber tev li ber sernixûn

Bi kur'de biçûna furişt pê re çûn

(Buheyra) çi nîşanê dîtin ev in

Ewî xwendibûn derniviştê kevin

Çi mohrek bi nûr e hebû nîv mila

Tîrêj lê bela bûn ji laş û cila

(Buheyra) digote (Ebîtalibî)

Nebî wî bi alî Cihûwan nebî

Neçin Şam çikû Şam li wî dijmin in

Dê winda bikin wey hewara li min

Ji (Busra) vegerrin herin ber bi mal

Yehûdî nebînin Kurdê pir şepal

Ji poşmaniyê ew diçû xwe bi gez

Ji wir ew vegeryane malê bilez.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

Zanhaweya Pêxember (Mewlûda Pêxember) ......................... 62

**Perçebêja 7**

## Muhemmed çilo (Xedîce) anî

Dema bîst û pênc salî bû ev ciwan

Ji bona (Xedîca) digel kariwan

Bi serdariya kole yê (Meysere)

Ji bo herne (Busra) ji mal bû dere

Li nêzîkî (Busra) hemî bûne kar

Ji piştra deva daketin çûne xwar

Li cem Dêra Nestûr li bin darekê

Muhemmed dirûnişt ji bo karekê

Ewê dara ser wî dikir tev pelik

Bi ser wî de berda siha xwey xweşik

Di hingî de Nestûr dizanî bikin

Ji Pêxemberan pêve nayêne bin

Ewî rahibî nû digot Meysere

Gelo ma bi çavê wî sorî ser e

Heger kû di çavê wî sorî hebî

Nişana dizî hingî wê peyde bî

Ewî jê re go: Sorî têde heye!

Ewî rahibî got: Mi pê ewleye

Digo: Meysere tu ji wî dûr nebe

Xweda ew mezin kirye hey jê hebe

Divê carê pir kedkirin bê jimar

Keda wek vê carê nedîtin ti car

Di pey de vegeryan berî dane mal

(Xedîca) ji dîna kurî bûye lal

Hebû ew li pêş wa li ser xaniye

Muhemmed ji dûrî bi sosret diye

Çikû dî furişta li ser sî kirin

Çi sîwan ji nûrê li ser wî kirin

Ji nû Meysere tiştê dîbû digot

Evîna Muhemmed dilê wê disot

Xedîca bihîstin çi pesnê ser e

Dizanî bi bawer kû Pêxember e

Xedîca jina şeng û terxan û naz

Digo: Min ji bona xwe îro bixwaz

Ewî go: (Xedîça) jina rû bi ken

Li ba min ti nîne ji bo te qelen

Ewê go: Dema ev wiha çê bibî

Qelen pir seraser ji alî me bî

(Muhemmed) digote mirovê xwe ev
Mirova bi vî tiştî kêf kirne tev

Dihatin zilamê ji xwehezkirî
Ji bo kû (Xedîca) ji xwer bikirî

(Muhemmed) bi wa re civîn yek şevê
Di gotin: (Xedîce) ji me kê divê?.

Ewê got: (Muhemmed) dixwazim bes e.
Hemû dil şikestî ji wir bûn tese

Bi kêf û bi rindî bi zêr û mitêl
(Ebîtalibî) jê re ew xwest ji êl

Digo: Ev kurê me wê deng pê kevî

Wê pesnê wî derbî ji nîv her devî

Xedîca guhaztin bi kêf û xweşî

Bi hev re buhartin çi salê geşî

Xwedê danê çar keç digel du kura

Çi şeng û çi nazik di rengê çira

Heçî keç ev in tû bizanî bilez

Diya mey bi şewq (Fatima) rûgewez

Digel (Ummî Kelsûm) di gel Zeyneb e

Li pey wan (Ruqeyya) zerî xebxeb e

Heçî kur ji wan (Ebdullah) yek heye

Birayê wî (Qasim) bihîstin weye

Kurek dî li pey wan xwedê dayî ye

(Ibrahîm) kurê (Mariya) Qibtî ye

Heçî kur mirin hersê hê ku piçûk

Heçî keç ji wana sisê bûne bûk

Heçî (Fatima) dol ji wê re pir e

B' (Şerî'et) ji bona Muhemmed kur e

Misilman kurê wî ne tev de bizan

Ji bona Muhemmed nebî dilxizan

Heta zariyek tu li ser wî nedî

Çi qencî bikî tu dibî bê xwedî

Seraser selatan li  ser wî bixwîn

Buhiştê bi çavê serê xwe bibîn.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 8

### Muhemmed Berê Reş danî

### (Cihûyî û Qureyşî bûn dost)

Dema sih û pênc sal ji sala kirin
Di hingî (Qureyş) (Ke'be) ava kirin

Çikû hilweşîbû ji ber lehiyan
Ewê kû dihatin ji alî çiyan

Di piştî ku (Ke'be) ji nû çêkirin
Li bejna mirovek dîwar lêkirin

Ji bona Berê Reş ku deynin serî

Di nava (Qureyşan) de bû berberî

Heçî hat û got: Ev ji karê min e

Di nav wan de bû bend û lêxistine

Bi ber hev de hatin divê paşiyê

Kirin dest mirovek bikî başiyê

Li hevdû civîn tev ji bo vê yekê

Ji bo yek li yê dî ti zorê nekê

Digotin ji alî derê Şeybî ye

Ku bê vir di pêşî bi destê wî ye

Xwedê kir (Muhemmed) ji wirde dihat

Bi wî tev de bûn xweş hemî şer hilat

Teva jê re got ev siparê te ye

Ti çawa bikî tû bi destê xwe ye

Kevir danî ser paçekî gote wa

Ji her êlekê yek wî hildan hewa

Teva ber bi hev re dihildane jor

Ji hevdû vebûn pir hesanî ne zor

Muhemmed bi destê xwe yê nazidar

Berê reş di danî li cih kir siwar.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 9

### Daketina (Cibraîl) û (Qur'anê)

Muhemmed ku çil sal kirin ta serî

Xweda jê re daxistî Pêxemberî

De qenca bi qencî bi mizgîn bikî

Neqenca ji agir bi dezgîn bikî

Di şeş heyva pêşî didîn xewnê baş

Hemû rast xuyabûn nexwar û neşaş

Ji bo kû Muhemmed li xwe ewlebî

Ji bo tirs ji wî re ji nû çênebî

Di çaxê ku (Cibrîl) ji vir pêde bê

Xwe bigrî li ber wî hiner lê hebê

Dixwest kû tenê bî di cihkî li dûr

Ji bona Xwedê her dikir zûrezûr

Di çala (Hiraê) bi şev lê dima

Ji tirsa Xwedê ew dibû wek şima

Di pey Rojiyê hivde roj kû diçûn

Di roja Duşembê gelek bû zebûn

Heta heşkerî deng ji Hêzdan dihat

Di hingî de gûman ji dil çû hilat

De ka tû bixwîne birayê birêz
Ewî got: Nizanim bixwînim bixêz.

Furişt ew guvaşt ber bi sînga xwe ve
Di cara diwem got: Bixwîn, bernede!.

Ewî got: Nizanim, bixwînim livir
Furişt ew guvaşt û ji wî zor dibir

Di cara siyem got: Bixwin hey çira
Ewî got: Nizanim bixwînim bira

Furişt ew guvaşt da jibo zanibî
Ji vir pêde bê cem ji bo karibî

Ji vir pê de sê sala hew kes didî

Ji bo behriya dil hewarê bidî

Di hingî de (Cibrîl) dibakir bi deng

Digot: Hey (Mudesir) li te bû dereng

De ka rab ne razê ji ter nabî xew

Cilê xew bişo tû bi avek bedew

Ji vir pêde (Qur'an) hin û hin dihat

Ji bo dînê Islamê kir kêferat.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

**Perçebêja 10**

## Destpêka bizav û xebata Pêxember

## (Qencî û ewlebûn li ser)

Di pêşî kesî bawerî pê nekir

Ji mêra bizane ew (Ebû Bekir)

Ewî bê guman zû (Muhemmed) hedand

Di roja Şikeftê digel xwe revand

Ji zaroka pêşî (Elî) pehlewan

Ji xatûna pêşî (Xedîca) giran

Kesê kû li aza bizane tu (Zeyd)

Ji kola bizane (Bilal)e ne xeyd

Di pey wa re Osman û Se'd û Se'îd

Kurê 'Ewf û Telhe hinek bûn bedîd

Ewî kû (Sedîq) ew misilman kirin

Di herdû cihanan bi mewdan kirin

Peristin di pêşî di pişta derî

Heta kû Xwedê got: Bikin heşkerî

Ji nû heşkerî badikir mêr û jin

Mirovê wî yê dûr dibûn hin bi hin

Çikû dev diavête pûtê ewan

Li ser kîn û qehra wî tev bûn rewan

Qureyşa li Islamê zorî kirin

Ji ber wa nema wan deborî kirin

Weha man di zorê di vî karê reş

Heta kû revîne diçûne Hebeş

Di hingî (Ebîtalibî) kir xebat

Xwe da ser birazî di ser ve dihat

Qureyşî ji ber wî gelek tirsiyan

Ji nû wan li ola xwe kir pirsiyan

Di hingî de pênc sal bihurtin ji çil
Muhemmed gelek jan didîtin bi dil

Di piştî ku pênc sal bihurtin li pey
Ebîtalibî can dida ax û wey

Di piştî sisê çûn (Xedîca) jî çû
Zimanê Qureyşa li ser wan vebû

Li wan bûne çavsor Qureyşî hemû
Sixêfê ne baş wan kirin rû bi rû

Qureyş zariwê xwe li wî hînkirin
Du pehnî di sola de wan xwîn kirin

Muhemmed diçû (Taîfê) doz dikir

Nedî kes li wê jî, bi wî poz dikir

Vegerya cihê xwe bi dilekî nexweş

Furiştê çiya hatine beş bi beş

Ewan go:Emê wan ser û bin bikin

Bera kes nemînî ne mêr û ne jin

Muhemmed nehişt û go: Belkî ji wan

Hinek bêne Islamê xortê ciwan

Di piştî (Umer) hate Islamê zû

Çi tirsa li ser wan hebû zû diçû

(Bilalê) Hebeş çûye cihkî bilind

Dida banga (Ellahû Ekber) li gund

Ewan gawiran pir kirin kêferat

Çi ked jî ne dîtin dema wan hilat.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 11

### Çûna Muhemmed (Q,E,L,S)

### bi alî Qudsê, asîman, text û kursî

Di şevkê siwar bû li ser Borepak

Çi hespek firok e serî qîz û çak

Ji ber wî di rabû bi xem û bi zîn

Di binde firî bû bi kêf û evîn

Li ser heşkerî ew bi can û bi tin

Ji malê bi şev çûye Qudsa mezin

Xweda ew bilindkir bire asiman

Hişê wî ne çûbû ji bîr û giyan

Xwedê ew li heft asimanan gerand

Furiştan bi kêf û xweşî ew hewand

Di asmanê pêşî wî (Adem) didî

Di yê dî de (Îsa) bi çavê xwe dî

Di yê dî de (Yehya) zilamê delal

Di yê dî de (Yûsif) ewê rû zelal

Di yê dî de (Idrîs) e xwedyê cila

Di yê dî de (Harûn) e xwedyê kula

Di yê dî de (Mûsa) zilamê çeleng

Di yê dî de (Birahîm) e bavê bi deng

Di pey de diçû jêrî dara kenêr

Dikir dengê xêz û nivîsîn li jêr

Xwedî perde yê nûr ji ber wî kirin

Hemû tirs û kêmî ji ser wî birin

Xwedê heşkirî nû xwe şanî dida

Ji sehwa Xweda ew ji hiş bû cuda

Di hingî de lê bû gerek pênc limêj

Xwedê go: Here zû li cihan bibêj

Di cih de vegerya bû ser doşekê

Xwelî bê li ser ê ku bawer nekê

Di çaxê sibê wî çi tiştê diye

Digot ew kesê bêne rastê kiye

Çi got û (Ebû Bekrî) go: Her weye

Qureyşa digo: Ev ji hiş wî deye

Xwedê da hina û ji hinka sitend

Dilê gawirê wir ji nûka şikand.

*Muhemmed e*

*serdar û şêr û şahê cîhanan*

*Muhemmed e*

*serkanê furiştê ser asmanan*

*Muhemmed*

*mehdervan e bo jîndar û her canan*

*Muhemmed*

*alî kê bî ew her navê dermanan.*

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 12

## Muhemmed (Q,E,L,S) li nav êla gerî û dûrv re (Bazda) ji Mekkehê çû Medînê

Di pey de Muhemmed li êla gerî
Ji bo age bin tev bi Pêxemberî

Ji xelkê Medînê şeşa dane dû
Weha man heta ku hemî sal diçû

Diwazdeh ji wan hatibûn bo tewaf
Hemû ketne ola Muhemmed bi maf

Di piştî vegeryane mal û ciya
Ji nû ola (Islamê) xweş bû xuya

Di pey de ji (Ewsî) û (Xezreciyan)
Zilam pênc û heftê, du jin wek çiyan

Dihatin Muhemmed li çolê didîn
Vegeryan (Medînê ) hemû dilbirîn

Ewana digote Muhemmed şepal
Were nik me çêke ji bona xwe mal

Çikû wan Qureyşa li wan zor dikir
Hinav û ceger tev li wan sor dikir

Muhemmed bi yar û hevalê xwe ve

Dizîka kirin kar û barê reve

Hevalê Muhemmed ji mal û welat

Dixwestin herin der ji bona xebat

Dixwestin herin wê Medîna delal

Ji bo kû ji xwer çê bikin pir heval

Qureyşî ji çûna wî pir tirsiyan

Ji bo kuştina wî kirin pirsiyan

Xwedê dayê destûr ji bo derkevî

Qureyşî ketin pêş ji bo nerevî

Muhemmed bi ser wan de axek weşand
Kesî ew nema dî, ewî rê kişand

Xwedê ew ruha kir ji destê ewan
Ji wan zû bi dûr ket sivik bû rewan

Şikeftek heye nav dikin (Xare Sewr)
Xwe tê de veşêra serekdarê gewr

Digel (Ebû Bekr)ê Sidîq bû cema
Ji ber wî kevokek di hêlîn de ma

Di ber dergehê wê dikir tevn û lîs
Ewa bê hiner pîreke bo xwe lîs

Li wir mane sê roja nû derketin

Di roja Duşembê bi ser rê ketin

Zilamek bi navê (Suraqe) dihat

Bi hespê di nêzî ewan de hilat

Muhemmed nifir kir li wî rû bi rû

Bi hespa xwe ve ew di axê de çû

Ewî gawirê nû hewar kir li wî

Muhemmed dilovan bihûrî di wî

Muhemmed giha bû (Qedîdê) li wir

Jinek dît ji mala wê pirsek dikir

Digo: Ka heger şîr û goştek hebî
Ezê maf bidim te li gorî te bî

Belê tişt ne dîbû di mala jinê
Muhemmed dinêrî li jor û binê

Di hûndir de dîbû pezek pir zebûn
Di qîla pezî de piça şîr ne bûn

Jinê gote destûr here wê bidoş
Belê şîr ji wê hê ne ketiye beroş

Ewî xwest ji Hîzdan pezî têr bikî
Peza wê delalê ji nû kêr bikî

Ji nû dest dida ser guhanê pezî

Di piştî guvaşt û didî şîr dizê

Ewî xwar û da her kesê birçiye

Heçî hat ji wî sosretek dîtiye

Firaxa jinê dadigirt û dibir

Kurê wê dihat û li şîr meyze kir

Digot :Hey diyê şîr ji ku hatiye

Di malê de yek pez guhan şîr niye

Diya wî digot: Mêrekî pir terêz

Li vir bûye mêvan bi tore bi rêz

Ji wî re digot pesn û nîşan hemû
Wilo kir weha kir di pêşya te çû

Ewî go zilamê Qureyşan ew e
Wekî kû ji ser dil firî bû kew e

Bi sûnda mezin ger mi ew dîtiba
Minê zû bi wî bawerî girtiba

Diwazdeh ji heyva(Rebî'a yekem)
Di roja Duşembê Muhemmed ji cem

Gihabû Medîna bi şewq û şemal
Hemû şarê bajêr ji wî mane lal

Hemû daketin ber bi wî ve bi keyf

Çikû hate cem wan zilamê bi heyf

Keçê wan digotin sipas û dirûd

Ji bona Muhemmed dixwendin sirûd

Muhemmed peya bû li warê (Qeba)

Hezarê misilman bi wî re teba

Li wir wargehek bo xwe ava kirin

Medîne kirin bûk bi zava kirin

Medîne kirin nav ji bo (Yesribî)

Ji bo kû bi vî navê pîroz bibî.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

*Muhemmed e*

*serdar û şêr û şahê cîhanan*

*Muhemmed e*

*serkanê furiştê ser asmanan*

*Muhemmed*

*mehdervan e bo jîndar û her canan*

*Muhemmed*

*alî kê bî ew her navê dermanan.*

**Perçebêja 13**

## Şengiya bejna wî

## Qenciya gel û hîlet û sinçiyên wî

Muhemmed di her tiştî de çêtir e
Ji mêr û jina her çi hûr û gir e

Ji wî re hemû pesn û nîşan hene
Ji pesnê mirovan gelek wêde ne

Li ser wî hebû bejn û bala xweşik
Ne gelkî dirêj bû ne gelkî kinik

Riwê wî sipî bû bi sorî belek

Du çavê wî girs û fireh bûn belek

Çi mijgul dirêj û binî kilkirî

Çi lêvê tenik wî Xwedê çêkirî

Du birhê zirav û di rengê kevan

Tevî kû dirêjbûn bi hev negihan

Diranê wî firk in devê wî fireh

Çi bêvil zirav û enî bû bi reh

Bi zend û bi benda mirovek sitûr

Ne gelek qelew bû negirs bû ne hûr

Bi navmil bi gerden riha wî giran

Serê wî bi por bû heta ber guhan

Li nav dû milê wî çi muhrek bi nûr

Hebû jê xuyabû çi pêtî ji dûr

Xwidana wî hûr bû wekî moriyan

Çi bihna gul û miskê jê fûriyan

Di çaxê Muhemmed diçû ser didan

Li cih kî  ne warxweş ne pir der diman

Ku pêlkî bibûna dirahişte dest

Ji bêhna Buhiştê dibûn jar û mest

Ewî dest dida ser serê zariwa

Te ew naskira ko li kû der biwa

Ji dêmê wî şewq û birûsk radibû

Bi sêwî hejara gelek şa dibû

Li ser kesekî wî xwe nedkir giran

Ji xwe pir fedî bû ji tirsa Xwedan

Dikir pîne sol û cilê xwey delal

Çi karek bidîta dikir wî li mal

Ji xwe pir dizanî peza xwe didot

Li ser kêm û jara dilê wî disot

Dirûnişt li cem ê hejar û şivan

Kesê kû nexweş ba diçû ser ewan

Bi kêmî ne nêrî li keskî reben

Digel destê dawa dirabû bi ken

Kesê kû li alî wî kirba ziyan

Dibûrî di wan de direngê diyan

Kesê kolebûna tevî jin biyan

Dibûrî bi warê bi gewd û piyan

Ji bona Xwedê wî dikir kîn û gir

Ji bo wî ji hinka gelek hiz dikir

Dida gav di piştî hevalê terêz

Digo: Da li pey min furişt bibne rêz

Li kê rast bihata silav lêdikir

Ji şah û qirala çi tirsek nekir

Çi xembarê axa Xwedê kû hebûn

Kilîtê ewan tev di dest wî de bûn

Çiya xwest ku jê re bibî zêrê zer

Ji agir bibada li newqa xwe ber

Siwarbû li hesp û ker û qantira

Ziyan lê bibûna ne go wî çira

Çi qerfê bigota bi rastî digot

Di nava limêjê dibû rengê rot

Bi kurtî di peyvî di nîvê civat

Dikir dost ji bo xwe çi xwedyê civat

Xwedê ew şiyand û ji wî hiz dikir

Bi rastî dipeyvî bi rindî dikir

Kesê xweş nizanê bê ew çi kes e

Xwedê me bidî xatirê wî bes e.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

*Muhemmed e*

*serdar û şêr û şahê cîhanan*

*Muhemmed e*

*serkanê furiştê ser asmanan*

*Muhemmed*

*mehdervan e bo jîndar û her canan*

*Muhemmed*

*alî kê bî ew her navê dermanan.*

**Perçebêja 14**

## Sosretên jê hatine dîtin

Hevala ji dest wî bi çav dîtine

Gelek sosretê bê ser û hem bine

Emê çendeka bo te berpêş bikin

Pir in em nikarin teva rêş bikin

Ji wan yek ev e hey bira tû biner

Li ser wî silav kir heçî dar û ber

Kurê wî (Ebîtalibî) gotiye

Bi çavê serê xwe mi ev dîtiye

Di rokê di gel wî bi der em diçûn
Mi dîtin çi dar û berê ku hebûn

Di ber wa re çû wan silav lêkirin
Li wî bûn evîndar û hez jê kirin

Bi wî re hina xwarinek xwariye
Ewê xwarinê her dikir zariye

Dilê her mirovan dikir ar û sir
Heçî av û xwarin bi wî bûne pir

Ji destê wî bû der çi avek zelal
Ji Hêzdanî pêve nizanî hewal

Li ser wî ne danîne mêşa ti car

Bi wî bawerî kir gurê sîx û har

Digel pezmij û zariwê pir piçûk

Furişt her li pey wî dibûne bilûk

Wekî hev didî wî li pêş û li paş

Çi tiştê bigota nebû tê de şaş

Piyê wî di latê diçû xwar û jêr

Xwedê ew ji cem xwe dikir av û têr

Wekî hev didî wî bi roj û bi şev

Perî bûne dijmin wî anîn li hev

Di ber mêjgeha wî de darek birîn

Ji darê bihîztin evîn û girîn

Di heyv û di rojê siha wî nebû

Ji malek mezin pir xuya pey de bû

Bi van bawerî kin çi hûr û gir e

Bes e em çi bêjin ku hîn mestir e.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e... Muhemmed e...*

*Muhemmed.. Muhemmed..*

**Perçebêja 15**

## Qenciya zariya li ser wî

Birê min li min ke tu guhdariye

Selatê li ser wî gelek qenciye

Heger tû selatan li ser wî bidî

Wekî kû tu kolê xizan berdidî

Selatek tenê tû bidî hey bira

Li pêşya te wê her bibî wek çira

Deha ger tu bêjî gelek çêtir e

Seda ger tu bêjî ji wê bihtir e

Hezarî tu bêjî li hafa ewî

Di çûna buhiştê li pey peyrewî

Muhemmed dibêjî ku navê mi hat

Divê hûn bibêjin li ser min selat

Kesê ku nebêjî ne dostê min e

Nema nas dikim kû ji postê min e

Keça (Ebû Bekrî) weha gotiye

Bi çavê serê xwe mi ev dîtiye

Digo: Min dirûtin dikir, rûgeşê

Berî roj hilê ew di çaxê reşê

Ji nişka mi dî kû çira vemirî

Ji destê mi derzî ket û gindirî

Muhemmed dihat û Xwedê ku bidî

Riwê wî dida şewq mi derzî didî

Mi go:Hey Muhemmed çi şewqa te ye

Ku hindur kirî şewq wekî lempe ye

Muhemmed go agir ji wî re hebî

Ewî paşî cihan ji min berze bî

Mi go: Ê nebinî te rindî kiye

Ewî go:Mirovek di xwer nediye

Mi go:Qey kiye ev kesê pir xizan

Ewî go: Ewê ew kesê tû bizan

Dema kû bi navê mi yek peyivî

Selatek li ser min ne da û revî

Selata didim ez bi dil hem bi dev

Li ser te Muhemmed bi roj û bi şev.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e... Muhemmed e...*

*Muhemmed.. Muhemmed..*

**Perçebêja 16**

## Qenciya çêkirina (Zanhawe)

Bizan xwarin û xwendina Jînbiwar

Bi vê haweyê kû me kir kar û bar

Bira ev di çaxê Muhemmed hebû

Belê ew bi vî haweyê ha nebû

Çikû hin dibêjin ji pêşî heye

Belê pir piçûk e ne ev haweye

Muhemmed di çaxê Xwedê çê dikir

Di roja ku çêbû (Serek jêdikir)

Ji bona (Huseyn) û (Hesen) jî wiha
Dikir kar û barek bi min ev giha

Musilmanê pey de xwe nû pê kirin
Ji kêfa Muhemmed mezin çê kirin

Emê jî wekî wa li pey wa herin
Ji vî kar û barê xweşik nagerin

Çikû tev de dabaşa Pêxember e
Ji bil xwarinê ko di deynin ber e

Hesanê ji (Besra) ewê zanewer
Weha gotiye hem ji dev bûye der

Xwezî min li vî tiştî xerc kiriba
Çiyayek  ji zêra bi kom û liba

Cuneydê ji (Bexda) dibêjî weha
Xwezî kim bi yê ku bi vîna giha

Şehê (Kerxî Me'rûf) ewê pir bi deng
Dibêjî kesê xwarinek xweş û şeng

Ji xwer çê bikî û bikî kar û bar
Ji bona Xwedê ew bikî zarezar

Li xwe (Wergerênî) cilê nû bi der
Bi îsênî ber xwe çira û fener

Bikî kom li ber wî heval û gelan

Bisojî li ber xwe kenîr û pelan

Bi laşê xwe werkî gul û nêrgiza

Bi Pêxembera re dibî ew siza

Heçî (Fexrê Razî) weha gotiye

Kesê ew li ser xwarinê xwendiye

Çi tiştê li ber bî çi pîroz dibî

Dilê wî di paşî be mîroz dibî

Heçî (Sirriyê Seqetî ) tû biner

Dibê tû li pey xwendina wê biger

Kesê kû li ber xwendinê rûdinişt
Wekê kû dirûnî di mergê buhişt

Evîna Muhemmed ewê ta ji wî
Me ev jî bihîstîn ji zarê ewî

Dibêjî ewê kû ji min kirye hêz
Ewê her digel min ve rûnî di rêz

(Siyûtî) dibêjî ewê serbilind
Cihê lê bixwînin ji tar û ji gund

Furiştê Xwedê tîne dor lek bi lek
Perî kû li ber bin dimînin gelek

Xwedê jî dikî dûr çi pirs û şewat

Di hafa Xwedê da di bênî hewat

Di gorî hesanî didî bersivê

Bese hey bira ma tu hêjî divê.

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

## Perçebêja 17

# Emê hawê çêbûna wî li gor gotina seydayê Waqidî bêjin

Bira tû bizan Waqidî gotiye
Ezê bo we bêjim li gora wî ye

Ji roja (Emîna) bi wî bar dibû
Wekî tiştekî pir mezin kar dibû

Çikû xewn didîtin wekî heşkerî
Ezê bo we bêjim ji heyva serî

Di heyva Receb de di xewnê de bû

Ewê dî ku Adem li cem peyde bû

Di heyva diwem de didî (Şîs) dihat

Di pey wî de (Idrîs) di ya dî hilat

Kete çar miha de ewî (Nûh) didî

Çi karê bihêlî Xwedê kû bidî

Di pênca de dî ko xuya bûye (Hûd)

Ji bo wî digotin sipas û dirûd

Di heyva şeşa de (Birahîm Xelîl)

Dihat û ji kêfa dikir (Lîle Lîl)

Kurê wî (Sima'îl) di pey wî bi lez
Di hefta de hat ew digo: Vame ez

Di heşta de (Mûsa) ewê pir bi deng
Serek da (Emîna ) jina şox û şeng

Di pey wî de (Îsa) kurê Meryema
Di heyva neha de li wir bû cema

Heçî hat û mizgîn dida wê gulê
Digo: Wê ji ser te niha êş hilê

(Rebî'ê Yekem) bû şeva pêşî ye
Emîna di dil de çi kêf dîtî ye

Şeva dî çi mizgîn dihate guha

Şeva dî di gotin Muhemmed giha

Şeva dî Emîna bi guh deng dikir

Furiştan sipasî dixwendin liwir

Di ya dî Birahim ewê çav belek

Ji bona Muhemmed dida mijdeyek

Di ya dî xuya bûye şewqek zelal

Di ya dî furişt lek bi lek hatne bal

Diya wî zimanê xweşik ba dikir

Digot: Dê Muhemmed xuya bî li vir

Diya wî dibar kir dilovaniyê

Ji ser Amina bir kula janiyê

Di ya wî de mizgîn giha asiman

Digel şarê cîhan ji mêr û jinan

Şeva dî (Diwazdeh) ji heyva xwe bû

Şevek heyv û rohnî çi tarî nebû

Di hingî de (Ebdul Mutelib) heval

Digel zariwê xwe nema bû li mal

Hinek cih ji (Ke'bê) heriftin li jor

Hemî çûn ji bo avekin ew li gor

Emîna digo: Wey li min rebenê

Jin û mêr nema bûn li ba min tenê

Hinek ez girîm û mi go: Wey li min

Tenê me, li ba min tu nîn in ne jin

Li ser kê ezê pal bidim wey gidî

Çi sosret ji nişka mi hingî didî

Mi dî xaniyê  min devek tê vebû

Jin in tê re hatin wekî wa nebû

Mi go qey heyîvin di şewqê dene

Dirêj in gelo yê wekî wa hene?

Hemî ber sipî ne hemî perdepoş

Ji bihna gulavê diçim ez ji hoş

Wilo nazedar in li ba xwe mi got

Ji (Ebdul Menafin) dilê min disot

Mi dî yek di rûnê de rastî mi de

Dibêjî tu pesnê Xweda pir bide

Mi go: Hey hevalê gelo tu kiyî

Tu gelek giranî ji xwe hêviyî

Digo:Ez diya her kesî ('Hawe) me

Ji bona Muhemmed li bendî te me

Ewa dî dihat û di rûnişt li çep

Digirtim bi xurtî bi dest û bi lep

Di piştî mi pirsî mi dî (Sariye)

Jina wî (Xelîlê) ku bavê me ye

Li pey wê ewa dî li pey min dima

Mi hew zanibû jê re bêjim çima

Mi naskir ji pirsê berî bersivê

Ku ew (Asiya) ye ziman hinguvê

Ewa dî ji yên dî teva geştir e

Jinek (Hole Mole) ziman xweştir e

Dihat û li ber min bi lez rûdinişt

Digo: Min ji bona Muhemmed xwe hişt

Xwe bavêje ser min ji êşa netirs

Xweda bo te yar bî li kesek nepirs

Mi go: Tu kiye? hey xuha navgiran

Digo: Meryema bo mi nav e bizan

Em in pîrikê wî kurê tey terêz

Heta çê bibî em dibin xêz e vêz

Li hindur mi nêrî dibî wek buhişt

Bi ser min de xuryan bi tilpa furişt

Bi (Surîyanî) bil ji wî peyivîn

Hemî zarê şirîn û hem hinguvîn

Di hingî mi nêrî sitêr dirjiyan

Li rast û çep û her welat û cihan

Di pey de Xwedê gote (Cibrîl): Her e

Di asman û qadan bikî tû ger e

Xweşik sade ke tû meya can û dil

Piyan ber bibin rêz li her al û mil

Heya dergevanê buhiştê her in

Heçî qîzikê kû memik nû der in

Bera tev de xemlê li hev kin belav

Veke dergehê tû bi misk û gulav

Bi lez dergehê heşt buhiştan veke

Çekê dergevanê buhiştê l'xwe ke

Bera bêne girtin derê Dojehê

Ji bo hatina serwerê (Mekkehê)

Di asman û qadan bi dengê bilind

Tu bakî di Şam û di Iran û Hid

Tu bêje evîndar bi hevdû gihan

Niha wê herin textebendê şehan

Xwedê got û wî tev di cih de kirin
Di pey de digel xwe furişt pir kirin

Perî wan sipî bûn ji rengê felek
Li dor Mekkehê ser çiyan bûn xelek

Emîna li pêş xwe nema perde dî
Di Şamê de (Busra) bi çavê xwe dî

Ewê dî ku alek li ser (Ke'be) ye
Li rastî cihan yek li çep jî heye

Mi dî kû li ber min çivîk digerin
Nikil zer û sor û perî gewher in

Li hundir weşandin sedê moriyan
Furişt hingî hatin li min qoriyan

Ewanî ji zêr û ji zîv û ji lal
Disotin di wa de gul û misk û al

Heyiv û sitêra xwe daxiste ser
Vexwarek sipî bû didî hate ber

Wekî hinguv e ew bi şîraniye
Wekî berf û bûz e bi sermatiye

Mi dî gelkî tî me, mi hin jê vexwar
Ji wê hîn mi xweştir nedîbû ticar

Mi dî çûkekî pir sipî hate mal

Dida ser dilê min du peryê şemal

Mi dî sanciwa min di cih de diçû

Di hingî Muhemmed ji bona mi bû

Hemî çûk û balinde û canwera

Bi mizgîn digotin: Tu bê ser sera

Heçî ax û av û giya û kevir

Teva badikir ku xwezî bête vir

Ji ber wî dirabûn bi rêz û şewat

Li ser wî digotin dirûd û selat

De hûn jî bibêjin li ser wî sipas

Ji bo em li cem wî bibin dost û nas.

*Ev dawiya Zanhawe ye, gothewî bi çêkirina Xwedayê bilind û mezin bû.*

*Sed pesin û sed şabaş*

*Tev de bêjin bi hev re ji bo şehsiwar*

*Qencî û ewlebûn lê bibarî bi bar*

*Muhemmed e ...*

*Muhemmed e...*

*Muhemmed..*

*Muhemmed..*

*Muhemmed e*

*serdar û şêr û şahê cîhanan*

*Muhemmed e*

*serkanê furiştê ser asmanan*

*Muhemmed*

*mehdervan e bo jîndar û her canan*

*Muhemmed*

*alî kê bî ew her navê dermanan.*

## Pesindana Pêxember

## (Q,E,L,S) bi hev re

Gotina xwendevan:

Sed pesin û sed şabaş bona te her bêjim..

*Bersivdana civatê*:

**Pesnê te kî zanî zanim tu serkanî**

Sed pesin û pesnê te kî zanî

Zanim tu serkanî pesnê te kî zanî

Bo min mehdervanî pesnê te kî zanî

Kî bavê tu anî pesnê te kî zanî

Tu şewqa cihanî pesnê te kî zanî

Hem şîr û şîranî pesnê te kî zanî

Wî şahê asmanî pesnê te kî zanî

Tu hildabû banî pesnê te kî zanî

Min bawer pê anî pesnê te kî zanî

Tu xwedyê Quranî pesnê te kî zanî

Tu lawê şêranî pesnê te kî zanî

Hem şûrê mêranî pesnê te kî zanî

Wî bavê nûranî pesnê te kî zanî

Ibrahîm haranî pesnê te kî zanî

Kevrê reş ku danî pesnê te kî zanî

Til pey wî rêzanî pesnê te kî zanî

Ez gorî wî canî pesnê te kî zanî

Wê roja germanî pesnê te kî zanî

Til ser min sîwanî pesnê te kî zanî

Tu dostê Hêzanî pesnê te kî zanî

Bo min tu nişanî pesnê te kî zanî

Pesnê te kî zanî pesnê te kî zanî.

## Zarîkirina piştî

## (Zanhawe) da Xweda bibarînî

Bi navê Xwedanê qencîker û dilovan

Pesnê qencî ji Xwedê re Serdarê cîhan

Zarîkirin û ewlebûn li ser heval û xizmê wî teva bin, ji ciwan û pîran. Hey Xudanê min, em hatine guhdariya xwendina jînbiwariya Pêxember û bijariyê Te, ji nav afirandiyê Te, ji bo Tu bi ser me de birijînî. Bi pîroziya wî xelat ew perwe, yan ê qenciyê û bilindiyê, me rawestînî li nêzî wî, di Buhişta fireh û nermîkar de, me kêfxweş bike bi nêrîna li hafa Te ya bilind û hêja, û me bipareze ji dijminê Xwe yî dijwar û êşdar, bi qencî, nazdarî û comerdiya Xwe, hey Xudanê me, em Te hêvî û zarî dikin bi saya (Mustefa) û hevalên wî xwediyên rastî û sozdariyê, û hogirên wî yên baş û serfiraz, ku Tu me re bibî arî û arîkar û rizgarî di cihanê de, û ji

me re kar bike di Buhiştê de gelek avaniyên hêja û xweş.

Û dîsa em ji Te dixwazin bi medhê Pêxember bijarî û xizmê wî yên karbilind û navbaş, ku Tu di guneh û sûcên me de, bi yek carî, bi nazdarî bibuherî û me ji giştê dijûn û tengî û dijwariyan rizgar bikî, û ji me qayil bibe bi wî karê me yî hindik ku me buhirandiye, bi dizî û heşkerî û gunehê me binuxumînî, lewra Tu pir Bilind û Gunehveşêrî.

Hey Xwedan, hey Serwerê qad û asîmanan, hey Xwedanê me, qenciya wî karê me ko me kir, hin û hin yan yekker, ji xwendina jînbiwariya di feremend Tu bigerîne ji bo bilindiya hafa Muhemmed qencî û ewlebûn li ser, dûv re ji bo bilindbûna heval û xizmên wî, ewên hêja, paqij û terêz, Xwedê ji laş û canê wan ê bêguneh dilxweş bî, û Tu bigihênî canê bavê me (Adem), ewê mezin û navdar, û diya me (Hawa), ewa nazik û nazdar û yên ku veketine ji herdiwan, ji pêxemberan û hinartiyên Xwedan, qenciyên Xwedê bibarîn li ser tevan; û Tu bigerînî karekî

baş û timder ji bo canê kesê ku ev xwendina hêja ji bo wan bûye û bi hodeya wan e û ji aliyê wan, û Tu bi Xwe çêtir tenha bi wan zanî û bike şewqeke pir geş bi ser gorên wan de, û qadê fereh bike di gorên wan de, ji herdû kêlikê wan, û dilovaniyê bi me jî bike çaxê em herne cem wan, hey Xwedanê serkaranê cihan.

Wehareng e, ji yê nêzî wan re û wan kesan re ku rawestine di goristana xwe de; û ji tevaya gorên Misilmanan re, û ji me û ji dê û bavên me re, ji pîr û rêzanên me re; û ji bo yê ku em hînkirine xwendinê û yên ku mafê wan bi zarîkirina bi qencî di histiwê me de heyfe û yê ku qewitî li me kirine, û yê ku me qewitî li wan kiriye, bi zarîkirin û hêviyên qencî, û ji bo wan koleyên Te yî bejindar û guhdar û ji gişî xwediyê ol û baweriyê re, û me dûr bike ji agir û dojehê û me bimirîne Misilman û dûr bike û bide alî ji ser me neqenciyan û çavgiriya sitemkaran.

Bi qencî û çavnêriya Xwe serekdarê qenc û dilovanan û doza me ye paşî pesnê rind û qencî

her dem ji bo Te didim her Şah û Xwedanê hemî êl û cihan.

******

Mele Nûriyê Hesarî

Zanhawe, di sala 1973yan de, di heyva (Zeynhate), bi çêkirina min û bi danîna xêzên min kuta bû. 17 perçebêj in. Û dergehên me bi (Tevtilî= dektilî) di sala 1984an, 26ê heyva Gulanê de hate nivîsandin.

(Xweş madî ji Xwedê re)

******

Piştî kutabûna başgebêjê ev tiştê hawê bêne gotin:

**Muhemmed e serdar û şêr û şahê cîhanan**

**Muhemmed e serkanê furiştê ser asmanan**

**Muhemmed, Muhemmed e bo jîndar û her canan**

**Muhemmed alî kê bî, ew her navê dermanan**

## Gazindaneke, pesn e, Pêxember e

## Sosreta çax û cîhanan serwer e

Sosreta çax û cîhanan serwerê paşê deman

Hodeya asman û qadan Ehmed û Mehmûd û Yasîn

Şahiya her canwera ye bo te peyde bûn mirov

Her nivîsarê xudanê gotinê wê bê zemîn

Gurzekî şewqa Xuda ye tişt hemû jê peyde bûn

Ê Xuda bo hatina wî çê kirin jîn û heyîn

Ademê paqij û nazik ber bi çav bavê te ye

Lê tu wî kanî û pêşî hê bi te derya kelîn

Peyde bû agir ji bo yê ku bi te bawer nekî

Çavereş û qîz e buhişt bo te şahî xemilîn

Bavik û sîfa te paqij paşiya Pêxembera

Hate cîhan kû hilînî tariya dijwar û kîn

Bo te sed mizgîn dihatin pêşiya tu bê cihan

Bûye govend e suriştan gulperî  yek ser civîn

Pir nişan bûne xuya tev bo mezinbûna te bûn

Yek ji wan hêzê li fila fil tevî wan perixîn

Rohnî da Necd û Hucazê pêtiya kohê Qubeys

Nav hemû dêwê li cîhan bûye halan û revîn

Şergelê wan çol beyaran şahê kê Ebû Zemzem

Lengerê hewana (Xusro) heşt ji wana herifîn

Tacê şahan ketne xwarê çûne serdev textebend

Heyv ji bo wî bûye du qet her qiral tev lerizîn

Torin û difra (Birahim) daye ser rêça ewî

Çar kenar cîhan bihîstin şûr ewî hilda bi dîn

Ew guha axa (Medînê) awirek daye cihan

Dest li ber wîna vewestîn şahê Furs û Rum û Çîn

Şewq û zanîn û riyê baş xiste nîv cerg û dila

Payetextê van qiranan tev de bûn bê zar û şîn

Dînekî paqij bi hîm kir çêtir e j' dînê berê

Lew  gelê cîhan seraser dî riya wî da rewîn

Bo te (Qur'an) hate xwarê zanewer tev kirne hat

Hê wekî alûsiya wî dî ti pertûka nedîn

Wî di ber dînê xwe dîtin sed hezar êş û reşî

Ceng li hawîrê welatî der hemû kirne bi xwîn

Hem di yek gavê gihayê wî cihê lê dî Xweda

Ew bi çav dî pê re peyvî hingî dawî aferîn

Ew mezinbûna giha wî her Xwedê nadî kesî

Kî li text û asimana ji hevalê wî gerîn

Dîn kuta kir, pût şikestin hate ke'bê kir tewaf

Ji civatê xwestî xatir şêst û sê sal bihurîn

Can sipart şahê hebûnê dîn û quran bo me hişt

Qad û asman bûne tarî can û dil tev bûn birîn

Hey hewarê em çi bêjin ev birîn naçî ji dil

Ew divê kû dîn bimênî tu kede nakî girîn

Ew dibêjî kî misilman kû li pey rêça mi bî

Dê li cem hafa mi rûnê di Buhiştê gulweşîn

Hey şehê min ez bi heyra min bi te bawer heye

Behrivanê te me her dem bi dilê ar û evîn

Bejn û bala te elîf e cam û yaqûtê zelal

Çavreş û dêmê girover gerdena gewr û zerîn

Ew zimanê şeng û şêrîn ew rewana tey giran

Şewq ji laşê ted çirîsî kes nebû têr ji nerîn

Nazik û merd û şepalî tû di rengê fenerî

Kêrsima tê heyv û rojê bêhn xweşê wek yasemîn

Xûy te xûyê surişta çêtir e ji yê her kesî

Va Xweda gotiye ev tişt sinçiyê baş lê civîn

Ger bikim derman seraser çem û derya yê hebin

Pesn û nîşanê te naçin bi jimar û bi erîn

Hey şehê min ez dizanim tû Xwedanê mehderî

Tû di wê roja giranî me ji nav agir derîn

Tû bi medhê (Fatima) kî tevlî yar û xizeman

Ê mir û ê hate kuştin me ji gunha vegerîn

Kû tu razî bî, me danîn ber kenarê dojehê

Tû bi çoganê xwe hingî me ji gasînê hilîn

Da buhiştî bin belê em nêzî qunaxê te bin

Em nizanin pir xizanin b' gazinî hatin gilîn

Gerçi qencî bo me nîn in her ji dilxwazê te ne

Mehderê em her dixwazin pir perîşan û girîn.

*Dawiya Mewlûdê*

*Xweş madî ji Xwedê re*

Zanhaweya Pêxember (Mewlûda Pêxember) ......................... 

# Kurtejiyana Mele Nûriyê Hesarî
# (1934 - 2011)

**Dilawerê Zengî**

Di sala 1934an de, li Hesarê, gundê Kercewsê, jidayik bûye. Di nava Kurdan de, bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mela Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê, ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (Hoz) Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xwenda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî Mela bûye, diya wî jî keça melan û jineke xwenda bûye.

Di sala 1939an de, pêşî li cem diya xwe (Xanim) dest bi xwendina Qur'anê kiriye, û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdne'îm xwendine.

Di sala 1940î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyanê xwe spartiye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mela Hisên xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê Tirkî de, ya ku li Hesarê bûye.

Di 1945an de, çaxê di nofa (sinif) çaran de, dibistana Tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mela Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê, ew û kekê xwe Mela Nezîr, çûne gundê Bilêderê, û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mela Mihemed, li gundê Êlihê (Niha bûye wîlayet û jê re Batman dibêjin), maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mela Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji Mela Faîqê kurê Mela Hesen girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeriyaye û çûye Hesarê. Ew û kekê xwe Mela Hemîd, ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê Xiznayê. Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mela Hemîd xwendiye heta ku “Sadulaha Gewra“ bidawî kiriye.

Di sala 1949an de, birayê wî Mela Hemîd, çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de, vegeriyaye Hesarê, lê Mela Nûrî li Xiznayê maye, îcar li cem Mela Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Lê, di dehê meha Heyvdarê 1950î de, Şêx Ehmed çaxê giyanê xwe spartiye Xwedê, ji wir çûye Tilmarûfê û li ba şêx Eladînê kurê Şêx Ehmed xwen-

diye. Mela Nûrî li wirê bûye pêbawerê Şêx Masûmê kurê Şêx Ehmedê Xiznayî.

Mela Nûrî di 20-saliya xwe de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Camêr digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe, deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê.

Ji destpêka sala 1967an ve, Mela Nûrî li bajarê Qamişlo – Rojavayê Kurdistanê dijiya.

Piştî nexweşiyeke dûrûdirêj, di roja 25. 01. 2011an de, Mela Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ji nav me barkir û li goristana Qidûr Begê hate binaxkirin.

Mela Nûriyê Hesarî çend xelat û rêzname wergirtine, wek:

-Xelata Cegerxwîn a afirandina helbestê (2008)

-Bawernameya rêzgirtinê ji festîvala helbesta Kurdî ya 12an li Sûriyê (2007).

-Rêznameyek ji dîdargeha çand û hunerê û kovara Mewasim (2014).

Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê xelatek bi navê Mela Nûriyê Hesarî da destpêkirin.

**Ji berhemên wî:**

- Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995
-Hostanîbêja Zarhaweyên kurdî, çapa yekem, Weşanxaneya Çanda kurdî, Stockholm 1996
-Hostanîbêja Zarhaweyên kurdî, çapa duyem, Qamişlo, 2024
- Axlîma: Pêlên Helbesta kurdî, 1996
- Rêziman: (Destnivîs).
- Ferhenga kurdî – kurdî, (Destnivîs).
- Ferhenga kurdî – tirkî, (Destnivîs).
- Ferhenga Kurmancî- Zazî, (Destnivîs).
- Vegerandina li ser Zimanê Erebî Şarvîn, (Destnivîs).
- Koledar: Çîrokek Helbestane ye, (Destnivîs).
- Dû Mar: Çîrokek Helbestane ye, bi zimanê Erebî ye.(Destnivîs).
- 11 Dîwanên Helbestan, (Destnivîs).
- Bîranîn, ji jiyana wî, (Destnivîs).
-Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), Qamişlo, çapa yekem, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapxaneya Beyan, 2024.

# Gehpênasa perçebêjên zanhawe


**<u>Hînvane Hejmara rûpelê</u>**

Pêşgotin ..........................................................3

Jêrbiwarî ...........................................................11

Rûpelek ji destnivîsê ............................................12

Perçebêja 1

Bav û kalên Muhemmed ên pêşî ...........................13

Perçebêja 2

Hodeya çêkirina zanhawê bi kurdî ........................19

Perçebêja 3

Pesnê xwendina zanhawê......................................27

Perçebêja 4

Çêbûna Muhemmed bi sosretên pê re xuyabûne...33

Zanhaweya Pêxember (Mewlûda Pêxember) ........................ 157

Perçebêja 5

Dabaşa şîrdana wî ..............................................45

Perçebêja 6

Paqijiya Muhemmed ...........................................57

Perçebêja 7

Muhemmed çilo Xedîce anî..................................63

Perçebêja 8

Muhemmed Berê Reş danî ...................................71

Perçebêja 9

Daketina Cibraîl û Qur'anê ..................................75

Perçebêja 10

Destpêka bizav û xebata Pêxember .......................81

Perçebêja 11

Çûna Muhemmed bi alî Qudsê û asîmanan ...........87

Perçebêja 12

Muhemmed li nav êlan gerî .................................93

Perçebêja 13

Şengiya bejna wî ...............................................103

Perçebêja 14

Sosretên jê hatine dîtin ......................................111

Perçebêja 15

Qenciya zariya li ser wî .......................................125

Perçebêja 16

Qenciya çêkirina zanhawe ..................................119

Perçebêja 17

Emê hawê çêbûna wî li gorî gotina Waqidî ..........125

Pesindana Pêxember ..........................................141

Zarîkirina piştî zanhawe.......................................143

Gazindanek li ser Muhemmed .............................147

Kurtejiyana Mele Nûriyê Hesarî ..........................153

Gehpênasa perçebêjên zanhawe .........................157

Zanhaweya Pêxember (Mewlûda Pêxember) ........................ 159

Zanhaweya Pêxember (Mewlûda Pêxember) ......................... 160